Çîroka parey

w: Hîzar mes`ud Xalid

Li serdemên gelek kevin solçêkerek (pêlavçêker) hebû. Ewî ew solên (pêlav) ku wî çêdikirin digel wan tiştên ku wî hewceyî pê hey, diguhartin.

Sol didane nanipêjî û li şwînê nan werdigirt.. Sol didane nêçîrvanî û li şwînê goşt werdigirt. Lê eve karekê bi sergêjî bû.

Demê rojekê çûye nik nanipêjî da bo xo nanî bînît, nanipêjî gotê: Ez ne pêdivî solame. Gozkê min yê şkesitî, herre gozkekî bîne û li şwînê nanî werbigire.

Solçêker çû nik gozkçêkerî û gozkek jê xwast. Lê wî jî gotê: Ez ne pêdivî solame. Heger tu bo min hindek goştî bînî, ez dê li şwîna wî, gozkekî deme te.

Solçêker çû nik nêçîrvanî. Lê wî jî pêwîsitî bi pîlavan nebû, belku wî kêrikek divîya. Lew gotî: Kêrika min ya şkesitî, bo min kêrikekî bîne û goştî li şwînê bibe.

Pêlavçêker çû nik kêrsazî. Lê wî jî pêlav nedivîyan…

Pîremêr wesitîya û ev arîşe roj bo rojê bo hemî xelkî dijwartir lêdihat. Boçî mirov bo bidestiveynana mitayekî divêt hinde tûşî sergêjîyan bibît?!

Pîremêr çû meydanka gundî û xelk kom kirin û arîşa xo bo wan vegêrra. Hemî xelk digel wî hevrey bûn; çunkî arîşa wan hemuwan wekî êk bû. Gotin: Pêdivî ye em hizirekê bikeyin .û bo vê arîşê li çareyekê bigeryêyin